

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEW ROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar ( 137) Sal 23 13.05.2018 z - 2630 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (75)L.S

# EFRÎN ...BIRÎNA KÛR!...




## Desteya sernivîser

Li roja Yekşembê 18ê Avdara 2018an, piştî berxwedaneke bê mînak li hember artêşa dewleta Tirk û çeteyên wê, û pêşkêşkirina sedên qurbanî ji pakrewan û birîndaran, keriyên dagîrkeran derbasî bajarê Efrînê bûn…Bi navê «artêşa azad» û di bin ala wê de, bi saloxên Ellahu Ekber, dest bi diziyê û talankirina mal û mewdanên xelkê kirin. Û çiku dewleta Tirk baş dizanî ku KAWA yê hesinker ji Kurdan re sembola azadî û serfiraziyê ye, û bi armanca şikandin û herifandina moral û derûna mirovê Kurd û birînkirina rûmeta wî ya netewî, berê wan diz û pêxwasan daye cîgehê peykerê wî.. Li wê derê, wan çeteyên xwefiroş, bi kîn û zikreşiyeke bêhempa, berê.......... 2

# Nivîskar û hezkerê Zimanê Kurdî

## Mihemed Zekî Emîn (Diljar Seyda) Ji nav me bar kir



**Roja Duşembê, 16ê Nîsana bihurî, li bajarokê Girkê Legê yê girêdayî Dêrika Hemko, ji nişka ve, dilê mezin ê zimanhezê Kurd, nivîskar û xebatkarê dilsoz Mihemed Zekî Emîn yê ku bi navê Diljar Seyda dihate naskirin rawestiya û xatirê dawî ji me xwest.**

**Ji bilî ku gorbihuşt Diljar Seyda serkirdeyekî çalak ê partiya xwe, (PYDKS) bû, ew yek ji damezrênerê Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî bû jî. Herweha ew yek ji endamên desteya weşana NEWROZ a Herêma Cizîrê û sernivîserê Kovara WELAT bû.**

**Bi çand û kultûra xwe ya zengîn, bi pênûsa xwe şêrîn û bi nalîn, wî rûpelên gelek Kovar û Weşanên bi Kurdî dixemiland, yên mîna Welat, Newroz, Pênûsa Nû, Riya Teze…û hwd. Ji.........** 7

**EFRÎN ... Dûmahîk**

guleyên xwe dane peyker û paşê ew rûxandine!.Piştî wî karê gemar û kirêt, wan aşkere diyar kirin û gotin ku :»EFRÎN ne ya Kurmanca ye, EFRÎN, Efrînê me ye!»…

Ji ber kiryarên hovane yên dagîrkeran, bi sedê hizaran keç û lawên gelê me mal, milk, gund, zeviyên zeytûn û hinaran li şûn xwe hiştine û ji neçarî koçber bûne, berê xwe dane çolan, di bin baran, sir û seqemê de, bê xwarin, vexwarin û bê nivîn li dora hev hêwirî ne!... Ji ber wê rewşa dijwar, û di siha kerrbûn û lalbûna civaka navnetewî û rêxistinên wê yê mirovî de, gelek zarokên piçûk û şîrmij, pîr û kal û birîndarên sivîl jiyana xwe ji dest dane û bûne qurbanên vê êrîşa hovane!.

Wekî em tev dizanin ku di dîroka me ya nûjen de, ev ne cara pêşî ye Kurd têk diçin, têne xapandin û şikandin. Diho li Kerkûkê, berî wê li Mehabadê, rêkeftina Cezayîrê …û hwd, Kurd bûne qurbanê berjewendiyên xelkê û qelenê wê, xwîna sor dane!. Piştî her ketin û likumandinekê, û di bin bandor û akama êşa giran de, tevlîhevî di mejî de çêbûye, li şûna ku em li sedemên têkçûnê bigerin da ku di paşerojê de careke din ew dubare nebin, em bi ser û guhên hev ketine û her aliyekî, aliyên din tewanbar tewanbar kiriye, û wî di ber ketinê de berpirsiyar dîtiye. Di wê xirecirê de, me rastiya rola dewletên herêmê û yên mezin ên cîhanê ku em «firotine» ji bîr kiriye, hêzên me yên siyasî ji hev ketine, xemgînî û bêhêvîtî di civakê de belav bûye. Bi demê re, birîna dil qeşmûşk digre, careke din Kurd bi ser lingan dikevin, xwîn di laşê wan de digere, dîsa ew berdewamiya daxwazên mafên gelê xwe yên rewa dikin.



Wekî çawa diho parek berpisiyariya partiyên Kurdan di wan têkçûnan wan de hebû ye, bêgomane îro jî berpirsiyariya wan heye, lê giring e lêkolîn, nirxandin, û lêvegereke giştî bê çêkirin, kêmasî û şaşîtî bêne destnîşankirin û dadgehkirina berpirsên wan ji gel û dîrokê re bimîne.

Aşkere û zelal hatiye diyarkirin ku EFRÎN di bazar û lihevkirina dewletên heremê û yên cîhanî de hatiye firotin, û li Asîtana, di navbera Tirkiyê, Îran û Rûsyayê de rêkeftinek hatiye pê, ku li gora wê, EFRÎN bûye berdêliya Xûteya Rojhilatê Şamê û hin xalên din ên ne diyar jî hene. Lê…Bi her hawî, berpirsiyariya Tevgera Kurdî her heye, ew bê sûc û guneh namîne.

Tevî ku em bawer in birîna gelê me kûr e, gotin û şîret di van qonax û movikên weha dîrokî de bê sûd in jî, lê, da ku birîna dilê me kûrtir nebe û rê li pêş keysebazan dûz nebe, hin gotin hene divê bêne gotin. Mixabin ku hin deng ji bal hin rewşenbîrên me bilind dibin ku perçekirin û bêhêvîtiyê di civakê de belav dikin, mîna gotinên «EFRÎN nema Kurdistanî ye»...û hwd, ku ew bang û hilwest cihê dax û xemgîniyê ne, pêwiste xwediyên wan dengan ji bandora gêjbûna bûyera giran hişyar bibin, çavên xwe vekin û bi hişmendî û dûrbînî biramin û tevbigerin, û divê em zanibin ku tevî kêmasiyên birayên me, her dê EFRÎN Kurdistanî bimîne, û her dê Kurdên parçeyên din ji me re bira û palpiştên sereke bimînin û xwîna me li ser yek xakê tê rijandin. Şahiya parçeyekî ji me re şahî ye û şîna wî jî, ji me hemiyan re şîn e. Derdê me yek e û neyarê gelê me jî yek e.

Hêvî û omîda me ew e ku em ji bîr nekin û di guhê me zengil be ku gava pêşîn a çareseriya doza me û bidawîanîna derd û xemên giran, çaksazî û durustkirina mala me ye!. Me xwestî, ne xwestî, kilîta çareseriyê ew e. Tevî ku ev rê tejî rêl û kelem e û neyarên hebûna me mayîn tê de çandine jî, lê divê em bidin ser û wê bişopînin. Ji ber ku gilî, gazin û girî bê sûde ne, em ê mîna her car, birîna xwe derman bikin û pişta xwe ji neyarên gelê xwe re venekin, tu carî pê bawer nebin, bi dilsozî û hişmendî, em ê xebata xwe bidomînin.

Weşana we ya xemgîn û birîndar «NEWROZ», serî ji pakrewanên berxwedanê re diçimîne û hêviya saxlemiyê ji birîndaran re dike, banga wê ya pêşîn ji hemû keç û lawên gelê me li hundur û derveyî welêt re ew e ku her kes li gora derfet û karîna xwe bi koçberan re alîkar be, çiku ew xwişk, bira, dê û bavên me ne. Ji hêleke din ve, ji bo vegera xelkên me ser xaka pîroz a bav û kalan, tê xwestin ku bi her hawî em bi wan re alîkar bin.

Li dawiyê, tevî teliya vê bûyera trajîdîk û kûrbûna birînê, baweriya me li cih e ku birîn sax dibe, xelkê EFRÎNê jî dê vegerin malên xwe, ser xak û zeviyên xwe, di gund û bajarên xwe de bi rûmet bijîn. Dagîrker, çete û pêxwas jî dê bi rûreşî ji welêt bêne derxistin û avêtin!.

# BABETA GIRÎNG LIPÊŞ SIYASETA KURD, ŞKENANDINA BÊDENGIYA LI BAKURÊ KURDISTANÊ YE

**Rojnameya Newroz-OSP**
**Gulan 2018 ,4**

Tirkiye diçe hilbijartinek pêşwext a hestiyar. Hilbijartinên Tirkiye bi awayek yekrast bandora xwe li rastiya bakurê Kurdistanê dikin. Ji aliyê xwe ve, hest û helwêsta dengdêrên Kurd bandorek berfereh li hilbijartinên Tirkiye dike, ligor gelek zanyar û pisporan reng dide encamên hilbijartinên Tirkiye.

Di vê çarçoveyê de Kurdistan24 dosyeyek – helwêsta Partiyên Kurdistanî – di hilbijartinê Tirkiyê de û Bandora Kurd di hilbijartinan de amade kir.

**Bersivên Sînan Çiftyurek– Serokê Giştî yê OSP**

**- Hilbijartinên pêşwextên Tirkiye, dikarin bandorek erênî li gengeşekirin arastiya Kurd li Tirkiye û bakurê Kurdistanê bikin?**

Bi awayek giştî, her hilbijartinek vejandina tevgera sivîl-demokrat ligel xwe tîn e. Biryara AKP û MHP a hilbijartina pêşwext a sepandî, li Tirkiye û li bakurê Kurdistanê jî, dê vejandina siyaseta demokratîk ligel xwe bîn e. Bêguman ev jî girêdayî, bicihanîna erk a propagandayî ya hêzên welatparêz, şoreşger û demokratîk e.

Em bi bawer in ku, siyaseta sivîl a ku ji dema şerên bajaran li bakurê




Kurdistanê bêdeng bû, dê dîsa vejandinê ligel xwe bibîn e. Bawerî jî têrê nake, em divê têkoşîna xwe ya vejandinê jî berfereh bikin. Ji ber ku, babetek herî girîng li ber siyaseta Kurd, şikenandina bêdengiya li bakurê Kurdistanê ye. Ev hilbijartin jî, dikarin bibin derfetek ji bo vê yekê. Bi kurtasî: ger heta 24ê Hezîranê bûyerên çekdarî rû nedin, ango tade û dorpêç li ser siyaseta sivîl-demokratîk neyê sepandin, kolan û meydan dê vejandinê bijîn.

**- Dengên Kurdan – di hilbijartinan de xwedî rolek çawa ye?**

Dengên Kurd di hilbijartinên Serokomariyê de dê diyarder bin. Ger di xûla yekemîn a Serokomariyê de namzetek ji %50 + 1 wernegire, dê giringiya dengên Kurd diyartir bibe. Ji ber ku, gava namzetek di xûla yekem de ji % 50 + 1 wernegire û encama hilbijartinê bimîne xûla duyem, Kurd deng bidin kî alî, ew dê serbikeve. Di vê çarçoveyê de siyaseta Kurd, daxwazên xwe dikare pêşkeşî her du aliyan û raya giştî bike, piştgiriya aliyê qebûl dike, bike. Ger her du aliyan jî qebul nekir, wê demê bi egerên diyarkirî, bangewaza boykotê dikare were ragihandin.

**- Tevgera Kurd – rola dengê Kurd di hilbijartinên pêşwext çawa dikare bîne rojevê û derfetê jê bi dest bixe?**

Potansiyela dengderên Kurd li Tirkiyê di hawîrdora ji %25an de ye. Her kes û alî, giringiya vê potansiyelê, dizane. Ger ev potansiyel bi bernameyek Kurdî û hevkariyek neteweyî-demokratîk bête xemilandin, dikare sûdên mezin bidest bixe. Rêya serkeftinê ya rola tevgera Kurd, ji yekîtiya neteweyî derbas dibe. Ji ber vê yekê, wekî Partiya Azadî û Sosyalizmê em di hevkariya neteweyî de rijd in.

**- Li gor baweriya we – aliyê Kurd di van hilbijartinan de, divê xwedî helwêstek çawa (nêzîkahiya blok, hevpeyman, hevkariyan) be?**

Wekî Partiya Azadî û Sosyalizmê (OSP) em piştgiriya pêkanîna bloka Kurdî ji bo hilbjartinan dikin. Pêşniyara me, di pêngava yekem de pêkanîna Bloka Hilbijartinan a Kurdî û di pêngava duyem de pêkanîna bloka herî berfereh a demokratîk ligel şoreşgerên Tirkiyê ye. Em xebatê dikin ku, îro ji bo hilbijartinên Serokomariyê û sibe ji bo hilbijartinên herêmî, damezrandina blokek neteweyî-demokratîk a mayinde hebe. Em ji niha ve, divê xwe ji wê re amade bikin. Ji ber ku çawa hilbijartinê sepandî yên Serokomariyê hate biryar dan, herweha biryara hilbijartinên sepandî yên herêmî jî dikare were girtin. Em ji niha ve, divê amadeyî vê yekê bin.

Bloka Kurdî girêdayî van hilbijartinên sepandî divê bi daxwazên zelal û bingehîn ên azadiya neteweyî kom bibe û beşdariyê bike. Namzediya Demirtaş hate ragihandin. Bloka hilbijartinê ya Kurdî, bi armancên xwe yên bingehîn û zelal ên azadiya neteweyî, divê piştgiriyê bide Demirtaş.

OSP ne ligel damezrandina blokên cuda yên Kurdistanî, lê ligel pêkanîna yek blokê ye û daxwaz dike ev yek ne tenê bi hilbijartinên 24ê Hezîranê ve girêdayî bimîn e. Li pêş me, hilbijartinên herêmî hene, divê ji bo wê jî, ev blok mayinde bimîn e. Bi avêtina van her du pêngavên pratîk, ber bi hevkariya demokratîk a neteweyî ve biçin.......

4

# Waneyên Berxwedana Efrînê

Nûşîn Bêcirmanî



Efrîn û herêma wê bi suriştiya xwe ji hermên kurdî yên din li Rojavayê Kurdistanê, cuda ye….

Ji destpêka kirîza Sûriyê, û dema gelê sûriyê bi piraniya pêkhateyên xwe ve serî li ber rijîmê bilind kirin. Miletê Kurd li wir jî beşdar bû û Ji ber pêwîstiya Efrînê ya ciyopolîtîkî gelek çav li ser hebûn, nemaze piştî ku rijîma Sûriyê bi dezgehên xwe yên ewlekarî û xizmetguzarî vekişiya, wê hingê miletê kurd li Efrînê neçar ma ku xwe birêve bibe di encamê de serkeftinên baş di jiyana xwe ya rojane de bidest xistin, nemaze piştî ku rêvebiriya xweser dezgehên xwe li wir damezrandin û di hemû aliyên jiyanê de çi abûrî, Rewşenbîrî, perwerde û şaredarî de bikar anîn, gavin avêtin nexasim di aliyê berevaniya di ber xaka Efrînê û gundewarên wê de ji hêla YPG / YPJ ê ve…

Bê guman ev rewş wê ne ciyê rezamendiya rijma Turkiyê û çeteyên pêve girêdayî be, ev ji aliyekî, ji aliyê din ve ya rijîma Suriyê jî heman helwest bû, wêlomê her yekî ji aliyê xwe ve Efrîn dorpêç kirin û çeteyên Tirkiyê weke Cebhet Elnusra û Daiş êrîş berdane ser ....

Rijîma Tirkiyê û bi behaneya ku PKK û PYD bikin metirsiya herî mezin li ser ewlekariya xwe ya netewî, ji wilo gef li Efrînê û şervanên kurd didan, ku wê êrîşî wan bikin....

Milet û şervanên kurd li Efrînê û digel newekheviya hêz û têkiliyên diblomasî di nabera wan û Tirkiyê de, ku di Nato de hêza diwemîn e û li seranserî cîhanê a pêncemîn e, tevlî wilo biryara berxwedana di ber xaka xwe de, dan û li hember tang , top û firokên leşkerê Tirkiyê û çeteyên wê, 58 rojan berdewam kirin û nehiştin bi hesanî wê xaka pîroz dagîr bikin.

Waneyên ku di berxwedana Efrînê de diyarbûn, hin ji wan ev in:

1 – Biyara berxwedanê tevlî newekheviya hêzê di navbera wan û artêşa Tirkiyê de, ev jî tê wê wateya ku em xaka xwe bi……

5

**Babeta giring... Dûmahîk**

**- Damezrandina bloka Kurdistanî, dikare rolek bandorî di hilbijartinan de hebe?**

Ev girêdayî bername, çarçove û xebata bibandor a Bloka Kurdî dimîn e. Ger Bloka Kurdî ava bibe û xebatek baş bike, dê di hilbijartinan de rolek xwe ya bi bandor hebe. Ango erk a bilez lipêş tevgera Kurd li bakurê Kurdistanê pêkanîna Bloka Kurdî ye. Ev daxwaza sereke ya gelê me, ji Partiyên me ye.

Gelê Kurd di babeta hevkariya neteweyî de du gavan li pêş Partiyên me ye. Helwêsta gelê me di rûdanên: Kobanê, Referendûma Serxwebûna Kurdistanê ya 25ê Îlonê, dagîrkeriya Kerkûk û Efrînê de, bi ser rewşên Partiyên me û rewşa perçeyî ya welatê me bû. Şîn û Şahiya gelê me li ser partî û parçeyên Kurdîstanê ye! Em bangî Partiyên me dikin: ew jî bibin xwedî hest û helwêstek weha.

Herweha, Koma muhafazakar a Kurd, ku di Hezîran a 2015an de ji AKP veqetiya, gava di Mijdar a 2015an de venegeriya AKP, em dikarin bibêjin, herî kêm, niha di helwêstek bêalîbûnê de ye. AKP di hewla vegera wan de ye, lê ji ber pratika wê ya îroyîn ev kom niha zehmet e vegere AKP. Di vê rewşê de, Kurd bi hevkariyek berfereh a neteweyî biçin nav gelê xwe, di encama hilbijartinan de dikare rewşek neyênî li pêş AKP derxe pêş.

**- Desthilat û OpozisyonaTirkiye di zanyariya giringiya dengê Kurd de ne?**

Hikumeta Tirkiye jî, dewleta Tirkiye jî, di zanyariya giringiya dengên Kurd de ne. Ya girîntir di zanyariya giringiya jeopolitik a Kurdistanê de ne. Birêvebirên dewleta Tirk di her pêngava xwe de, bi vê zanyariyê tevdigerin. Babeta bîngehîn li vir ew e: Tevgera Kurd, bi zanyariya giringiya dengên Kurd tevbigere.

Wekî encam ez dikarim bibêjim, Li hember "Hevkariya Cumhur" ku ji metirsiyê tevdigere, hevkariya azadiya neteweyî û demokrasiyê xwedî giringiyek jiyanî ye. Pêngavek weha, dê bîngeha AKP li Kurdistanê teng bike, kêm bike. Ji ber ku gelê me/gelên me helwêsta êrîşbar / dagîrker a hikûmeta AKP hemberî Serxwebûna başûrê Kurdistanê, dagîrkeriya Efrînê / Rojava, êrîşbariya ku malên xelkê me li bajarên wan bi ser wan de hilweşand, girtina nûnerên xwe, şaredarên xwe… napejirîne!

Dilgiraniya bêdengiya sê salan heye. Ger siyaseta Kurd hevkariya xwe pek bîn e, dê hêzê bide bi zimananîna vê dilgiranî û bêdengiya gelê xwe. BI van egeran, wekî OSP em bi daxwazên neteweyî-demokratîk, ligel damezrandina Bloka Hilbijartinê ya Kurdî ne…

# Di hundirê min de hew qîrek e...Efrîn

**Hekîm Ehmed**

Efrîn!!?? Ne weke her nûçeyekê, mirinekê, têkçûnekê bû ku min bihîst.. Min hewl dida ku guhên xwe bi çavên xwe re bigirim, nehêlim êş derbasî serê min bibe, gelo mirov dikare tiştekî ji hişê xwe veşêre, serê xwe dihejînim û dibêjim dilê xwe na, vê bawer neke, tim min digot hov derbasî buhiştan nabin, min li Kobanê jî got, bawer neke dilo..

Xwedêyo, ez nikarim veşêrim û destên min ji peyvan jî kintir bûne, weke çûkekî baskşikestî di nav vê bobelatê de kefteleftê dikim, Efrîn!!?? Ez yê carekê tenê min bilindî û şanaziya xurista wê dîtiye, ez yê çend hevalan li wir dinasim, ewqas qîr di nava min de dikelê, gelo çi halê te ye keko? Tu yê îro bêbextiya cîhanê û dîrokê li pişta te bar bûye?!

«Siyaset ji berê ve xap û fen û fût e, bêbextî û hovîtî û berjwendprerstî ye» Hevalekî min dibêje, hişê min dibêje heye ku ev rast be, em bêhişên dilpak nizanin bazaran bikin, lê zimanê ku di dilê min de dike hawar, dîsa diqîre: Êêêêê.. û çawa cîhan bêdeng e, çawa ji mafê xelkê ye ku ewlehiya xwe bi kuştina zarokên me û xirakirina malên me biparêzin? Êêê... û çima ev asîman hîna sayî ye û ev çiyayên han nalivin, ma wilo tu hêz di vê gerdûnê de pasevaniya bindestan nake?.. Naxwe jiyan tev êdî bê wate ye.

Vedigerim mal, li zarokên xwe temaşe dikim, zarokên ku eger çiqas bargiraniyek hebe jî, dikarin dilê min şa bikin û ken bînin ser lêvên min, lê vê carê na, tenê pirsek di dilê min de dubare dibe: «Gelo zarokên we li ku ne? Dikarin vê şevê bi rêyên wenabûnê de bimeşin? Rêya wan li ser milên we û di hembêza we de maye? Berê xwe didim tariya şevê ku di pencerê re xuya dike, îşev sar e, heta bi seqayê jî bêbext e îro.. Hevjîna min dipirse: - Çi bû ye, tu ewqasî westiyayî xuya dike? – Nizanim çi bibêjim, lê win nema ji bo rawestandina êrîşên li dijî Efrînê derdikevin xwepêşandanan.

Naxwazim li nûçeyan guhdar bikim, bila ez nizanibim ku rê hemû di riwê bêkesan de girtî ne, hêza min tune ye wêneya dayikekê, bavekî yan zarokekê li ser rêyekê bibînim, bila wêneyên berê di hişê min de bimînin ku bumbebarankirin malan bi ser xwediyên wan de dixin xwar û ji wan re xanî dibe goreke bi rûmet, mane em hew ji ber vê li ser vê xakê man?.

Navê Xwedê çiqasî vê rojê tê gotin, ez yê xwe bawermend dibînim, nizanim çi bibêjim, hew pirs di hişê min de dikelin û bê bersiv dişewitin, lê li gorî hevalê min dibêje, rewşa welatan weke lîstika şetrencê û hesabên matmatîkê birêve diçe, nizanim çawa hişê xwe bi vê agahdar bikim bêyî ku ez sixêfan bikim, yan jî ji dilê xwe re bibêjim ku yasaya vê cîhanê ew e ku «Mirov bi xwîna mirovan dilîzin».. Êêê..û çima rêxistin û qanûn û dewlet ava bûn, çima ol û pêxember û xêrxwaz di vê gerdûnê de derketin, bila bi hovan re dîsa li daristanan bijîn, ez dîsa çûkekî lawaz û bêkes im, baskşikestî û piştxûz çavên xwe digrim.

---

**Waneyên ... Dûmahîk**

hêsanî û bê berevanî radestî rijîma Tirk û hevalbendên wê ku bermayên DAIŞ û NESRA ne , nakin... Mînakek wek vê di dîroka Sûriyê de naskirî ye dema ku Firensiya dixwestin derbasî Şamê bibin, şalyarê berevaniyê yê Sûrî, Yûsif Elazma yê nijad Kurd bû got: Firensî ji me bihêztirin lê da nebêjin Şam bi hêsanî û bê berevanî radestî me kirin, emê berevaniyê ta dilopa dawî ji xwîna xwe, bikin.

2 – Yekîtiya berxwedanê di navbera şervanên kurd(YPG/YPJ ) û miletê sivîl de, xweşik diyar bû, tevaya gel mil bi mil li kêleka şervanên xwe rawestiya.

3 - Gelek ji şervanên kurd di berxwedan û fedakariya xwe de bûne mînak, xêzên lihengî û berxwedanê ji dîrokê re tomar kirin, Evista Xabûr û Barîn Kobanê weke mînak in.

4 – digel tundiya êrîşa artêşa Tirkiyê û çeteyên wê, xak û asiman tev dibû agir û dûman, bi hemî cureyên çekan êrîş dibirin ser malên sivîlan , lê, miletê Efrînê dûrî xaka xwe nediçû , her û her çavê wî li vegera bal bi gund û bajarokên xwe ve bû, em jibîr nekin ku hîn hin ji welatî û endamên partiyên siyasî kurdî li Efrînê di heremê de ne û jê dûrneketine.

5 – Êrîşa Tirkiyê ne ji bo dûrkirina YPG/YPJ û PKKê ye...! lê belê, rawestana li hember rêvebirya xweser li rojava û bakurê Sûriyê ye, da wê têkbibin , ma roxandina peykerê Kawa yê hesinkar yê ku ji mirovatiyê re bo simbola berxwedan û lihengiyê ye, gelo ji bo PKK û PYDe ye...?! A din binpêkirin û riswakirina Ala kurdî ya ku hîç girêdanên PKK, PYD, YPG û YPj pêre nînin; ev bi zelalî diyardike ku şerê Tirkiyê ji bo ku tu pirojeyên Kurdî li Sûriyê neçin serî, kîjan aliyê kurdî xwediyê wê be li bal Turkiyê tu cudayî nîn e .

6 – Her û her dijminên gelê Kurd liser pirsgirêka kurdî dibin ye, û li hember pirojeyên kurdî li her çar parçeyên Kurdistanê radiwestin; li hember wan tevgera kurdî û Kurdistanî ji hev belawela ye, her partî, çarçew û hêz li berjewendiyên xwe yên partiyane digere, ev sedema herî giring a têkçşna me ye.

Bê gumane gelek waneneyên din jî hene, hêîdar in sûde ji wn were girtin.

# Kawa rabe!!.

**Mihemed Zekî Mihemed***

Kawa rabe! Binêre bê çawa Avdara ku te bi roja Newrozê xemlandibû, newroza ku bûbû şana berxwdanê dijî zor û stemê, şana evîn û hezkirinê bi vebûna gul û kulîlkên Buharê, bûhara Kurdistanê tê xemlandin, Ezdehak û Holako yê sedsala bîst û yekê dixwazin agirê wê vemrînin.

Berî dora du mehan êrîşeke hovane birin ser Kurdaxê ango Efrîn, bi hemî hêza xwe ji balafir, tang û topan ev bajarê Zeytûn û aştiyê bombebaran kirin, bê cudahî di navbera mirov, kevir, zarok, kal û jinan de, ev hemî jî ji ber ku hîna kîna te dilên wan deye û şax veda ye Kawa...!

Ji ber ku Efrîn landika şaristanî û pêkvejiyanê ye, li ber çavên dijminan reş e.

Gelek lêkolîner tekez dikin ku li dirêjahiya hezarên salan li dora çemê Efrînê jiyan bûye, ew destpêk bû ji cîwarbûna mirovan re, her weha li kêleka gudê Eyn Dara gundeke heya ku destpêaka çandinyê ji wir destpê kiriye ku vedgire serdema kevirî ya nûjen (50008000-) B.Z, bi dehan gir û cîgehên arkolojî hene û bê lêkolînkirin mane, bêguman dê gelek razan di hundirê xwe de dihewînin.

Cendekê zarokekî ku li serdama mirovê niyandertal vedigere, li çiyayê Lêlûn ji herêma Efrînê hatiye dîtin, ne li dereke dine, ev diyar dike ku wê serdemê xwedî bawerî û rêweresm bûn ta ku miriyên xwe vedişartin.

Perstgeha Eyn Dara ji kevintrîn perstgehên B.Z hatiye vedîtin, li Çiyayê Kurrmênc e, berî vî şerê xwîndar jî rêjeyeke baş ji avahiya wî parastî bû.

Li gundê Xirab Şems li çiyayê Lêlûn (Şêrewan) serê gayekî û wêneyê rojê li jora dergehekî ji xaniyekî arkolojî yê kevnar kolayî ye, lêkolîner dibêjin dibe ku ew dergehê perestgeheke kevn be ku dîroka li sedsala (3)an a zayînê vedigere û perestina diyardeyên xuristê ji peristên kevnar ên ariyan e ku li Kurdistanê pêk dihatin, Zerdeştiya Heyv û Roj di Enya (Ahora mezda) de didîtin ku pê li hemberî xwedawendê şer (Ehrîmen) radiwestiya, wekû em tev zanin ku Roj nirxekî bilinad di ola Zerdeştî ya kevn û ya Êzdî ya nû de digire ku Roj çavên xwedawend (Ahora Mezda) ne.


Xirab Şems

Kizînfonê Yonanî di (Pêvajoya deh hezaran) de dibêje: Yên li qiraxê çemê Kalos ‹›Efrîn›› cîwar bûbûn Masî pîroz didîtin.

Hêjayî gotinê ye ku wêneyê du Tawisan baramberî hev heye ew jî li ser dêra gundê Kîmara ku dîroka avkirina wê li sala (537)ê Z vedigire û bi gerîndeyekê pêçayî ye û yek di hudir de jî heye, em tev dizann ku teyirê Tawis di baweriyên Êzdiyan de serokê Melyketan e (Tawisê Melek).

Kawa! Bi dehan cîgehên arkolojî di Efrînê de hene ku Kurdîniya wê tekiz dikin, pêkvejiyan û aştî ku têde hebûn diyar û berçav dikin.

Kurd bûn ên ku bi salan, li Heleb û derdora wê destaldarî kirine.

Kawa! ên ku di rûyê firansiyan de rawestiyan Kurd bûn, û guleya pêşîn ji aliyê Miho Îbo şaşo yê kurd ve hatiye berdan.

Efrîn e, ya ku Mîr celadet Alî Bediraxn serdana wê kiriye.

(4 ji 7)an ji damezrênerên yekmîn partiya kurdî li Sûryê di sala (1957)an de ji Efrşnê bûn.

Bi sedan yên ku xwedina bala xilaskirine ji efrînê ne.

Û bi seden mînak ku têra pesndina Efrînê nakin ji herkesî re xuyan e.

Bi taybetî jî berxwedan û pêdariya ku ev dora du mehane li hemberî Ezdehakê serdemê kiriye.

Kawa! Rast e ev şer bi behaneya şerê dijî partiyêkê bi tenê ye, lê di naveroka xwed şerê hebûna gelê kurd e, tolhildane ji ked û xebata te re ey kawayê hesinkar.!

**** Ev gotar ji berî koçbarkirinê, nemir Mihemed Zekî nivîsandibû.***

# Dîdarek li gel Ajansa Sputnik

Endamê Polîtburoya Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê (PYDKS-Yekîtî) Mehmud Mihemed daxwaz kir ku partiyên kurd bi name û peyameke hevbeş li Hewlêrê dengê xwe bigihînin Neteweyên Yekbûyî (NY) û nûnerên welatên cîhanê. Mihemed got, «Pêwîste partiyên siyasî yên kurd peyameke hevbeş bigihînin NY û nûnerên welatên cîhanê li Hewlêrê sebaret êrişên dewleta turk bo ser Efrînê, û jê bixwazin ku vî şerê hovane li hember gelê kurd rabigirin ku welatiyên sivîl dibin qurban. Herwisa em bangî tevgera siyasî ya kurd jî dikin ku pêwîst e em ji xwe re mifa werbigirîn ku çawa sê dewletên netewên ji hev cuda û ajanndayên wan cuda ne, û nakokiyên wan ligel hevdu hene, lê li ser pirsgrêka kurdî dibin yek. Mixabn em kurd nabin yek û ji miletê kurd re baştir diyar bû ku welatên mezin tenê berjewendyên xwe dinasin, û çawa bi piştgiriya wan di roja 16 Cotmehê



mehê de Kerkûk hate dagirkirin, niha hewl didin ku Efrînê dagir bikin. Em ji hemû cîhanê re dibêjin ku kurd li her çar perçeyên Kurdistanê bi êrîşa Tirkiye ya li ser Efrînê nerazî ne.»

**Mihemed Zekî... Dûmahîk**

bilî belavkirina dehên gotarên hemereng di malperên Kurdî de.

Diljarê bînfireh, dûrbîn û dilgerm, yê ku her dem û gav devliken û geşbîn bû, tevî hemû tengasiyên jiyanê, ew bê hêvî nedibû û her xebat pê şêrîntir dibû. Ew sala 1972an ji dayik bûye, di malbateke welatperwer û gelhez de çavên xwe vekirine û perwerde bûye. Ji piçûkaiya temenê xwe ve, ji zimanê dayikê hez kiriye, xwe fêrî xwendin û nivîsandina pê kiriye, û paşê tevlî rêzên tevgera siyasî ya Kurdî bûye. Wî xwendina xwe ta Bekalorya li bajarê Qamişlê xwendiye, lê ji ber ku ew mektûm-el qeyd bû, destelatê fêrnameya wî nedayê û rê li pêşiya çûna wî ya zanîngehê hate birîn.!

Hêjayî gotinê ye ku bi sedan hezkerên wî, dost û hevalên partiya wî, partî û saziyên sivîl di veşartina wî û konê behiyê de beşdar bûn, gelek gotin, gotar û helbest li ser hatin gotin. Bila serê we xwendevanên hêja û gelê me sax be, cihê (Bavê Evîn) bihuşt be, û bila di gorna xwe de, di xaka bav û bapîran de aram raze, ji ber ku ew ked û cefaya wî û yên berî wî kirine, bê gomane dê ber bigre û rêya me ronî bibe.

Li dawiyê, em vê peşaneya nivîskarê diltezîn Besam Mustefa li ser Diljar Seyda yak u bi navê «Diljarname» nivîsandiye, pêşkêşî we dikin:

### Diljarname

Diljar!
Ez dizanim ku mirin li welatê min
Bûye çemek û diherike
Ez dizanim ku her roj mirin
Strana xwe bi sê dengan dibêje…
Lê mirina te, wek payîzeke dereng
Pel ji daran weşand
Xetîreya hêvî û xewnan a geş û gurr
Kuşt û temirand…
Hêsir ji çavên min barand..
Te Kurdistana bedew îro
Bi oxira xwe ya pêşwext
Mîna nêrgizekê çilmisand…
Diljaro!
Malnemîrato!
Te ne tenê zarokên xwe
Lê te gelek tîpên zimanê şîrîn
Gelek rûpelên xemgîn
Gelek pirtûkên hêja
Gelek dehl û devî û giya
Gelek şagirt û
Gelek dostên mîna min jî
Di nav çemê mirinê de
Îro sêwî hiştin.
Digirîm…
Wek kesekî ku welatê wî jê hatibe dizîn digirîm
Wek kesekî ku bavê wî dîsa miribe digirîm
Wek kesekî ku Efrîna wî hatibe talankirin digirîm
Ez Kobanî, Qamişlo, Dêrik, Girkê Legê, Amûdê û Serê Kaniyê digirîm…
Her cara min dengê te
Di inerneta naletî de dibihîst
Dilê min wek dilê zarokekî biçûk digirnijî
Bêhna min qasî bexçeyekî rengîn vedibû…
Te digot: «Tu şîrê şêr bixwazî ez ê ji bo te peyda bikim!»
Lê vêga ez ne şîrê şêr û ne jî zêrê li paş heft behran dixwazim
Ez tenê te dixwazim!
Dengê te yê dilovan dixwazim…
Diljar!
Li esmanan dinihêrim…
Li jêr
Jiyan her diherike…
Wek ku ne Diljarê min bû yê ku al û sirûd li xwe pêça û çû…
Wek ku ne Diljarê min bû yê ku perperok û gul û kulîlk birin û çû…
Wek ku ne Diljarê min bû yê ku dilpakî û camêrî û evîna zimanê dayikê û çand û kelepora Kurdî bi xwe re birin û çû….
Esman reş dibe…
Ewr belav dibin…
Kevokek dilekî jar û şikestî direvîne û
Ber bi dûr ve bi firê dikeve
Rehma Xwedê li min be….
Rehma Xwedê li min be….

**Nameyek ji ... Dûmahîk**

Keç e
Bûk e
Dayîk e, jin e
Erdê Efrînê tev sor bûye
Wekî Qoçkîrî
Wekî Pîran
Wekî Agirî
Wekî Zîlan
Wekî Dersim
Wekî Mihabad
Wekî Helebce û Enfal
Wekî Kobanî
Reng xwîn e

Ax hewaaaaar, hewaaaaaar
Axli serê min
Pênce mîlyon dayîk û bav digîrin
Gîrî bûye para Kurd
Kêf bûye para Tirkên barbar
Tirk gurê har e
Zalim e, dijmin e
Lê cîhan li hember vê barbarîyê
Guh kerr e, çav kor e
Kurd jî bûne neyarên hev
Yekîtî tune
Dayîk û bav digîrin
Di malan da şîn e
Reş girêdane di gorê da
Meleyê Cizirî
Feqîyê Teyran
Fîlozofê gewre Ahmedê Xanî
Li Qamîşlokê Cîgerxwîn e
Li Awistûralya
Kalê heştê sê salî
Riza Çolpan e
Rizê Alê Memê şivan e
Di dilê wî da xwîn diçe
Nikare here meydana şer
Ji ber ku ne ciwan e
Ew bang dike, dike
hewaaaaaaaar, hewaaaaaaaar
Dibêje "Serokên Kurd rabin ser lingan e
Barbaran jibo me Kurdan derxistine ferman e
Ferman tunekirina me Kurdan e
Girtina Efrînê
Tevahîya dayîka me Kurdistan
Li holê rakirine 50 mîlyonê me kesan e"


Hewaaaar, hewaaaaar
Ax li serê min
Histêr di çavên min da bûne çem û robar
Digîrim jibo Efrînê
Bi qîrîn bang dikim
Dibêjim ey cîhan
Heft mîlyarên çav kor û guh kerr
Li Kurdistanê Kurd tên kuştin
Ew ne ajal ın, ne jî kevir û dar
Hemû reben û belengaz
Şernexwaz û aştîxwaz
Wekî we hemûyan mirov in
Ne ku hirç û hov in

Hewaaaaaaaaar,
hewaaaaaaaaaar
Ax li serê min
Raymezin bêdeng in
Temaşevanê ceng in
Dil qirêj, dil jeng in
Piranî bûkelemûn
Xudan pirr reng in

Pênûsê lehengan (!) şikestîne
Deng ji wan dernakeve
Kes nizane ew li kune
Leheng û mêrxwas Serokên Kurd
Gîşt li dijê hev in
Evîna Neteweyî
Yekîtîya biratî
Di dilê wan da tune
Sed mixab, sed heyf
Dane gelê xwe derd û kul
Ji dijminan ra jî ken û keyf
Ku heye Xwedê ne pejirîne.
------------------------------
Roja zimanê zikmakî: 212018-2-

# Herdu navdarên Kurdaxê

# Ehmed Resol û Îbrahîm Qadêr Koçbarkirin



« Nemir Ehmed Resol»




« Nemir Îbrahîm Efendî»

Eve çend meh in ku, herêma Efrînê (Kurdax) êşekên giran û birînên kûr dibîne, xelkê wê li dervayî welat û li hundir, bi dilekî xemgîn koçbarkirina herdu navdarên çiyayê kurmênc, bijîjk Dr. Ehmed Resol û mamoste Îbarhîm Qadêr bihîstin. Ehmedê Xocî Resol, li gundê Avrazê, sala 1934 an ji dayîk bûye, xwendina seretatyî, sala 1954 an li dibistana Elme›imon – Heleb bidawî kir, û sala 1956 çû Almaniya ta ku, xwendina xwe ya bijîjkiyê (الجراحة العامة- Nişdariya giştî) sala 1967 an bi dawî kir û vegeriya welatê xwe Sûriyê. Li Helebê cîgehekî bijîjkiyê û xestexaneyek ji karê xwe re vekir, li Kurdax û Helebê bi nav û deng bû. Ew bi sinciyên mirovahî û berevaniya di ber doza gelê xwe yê Kurd de naskirî bû. Ji ber sedemên siyasî û ewlekariyê, sala 1981 an careke din, tev jin û zariyên xwe barkir Almaniyayê, û li wir karê xwe berdewam kir. Roja 05.05.2018 an koça dawî kir, û li Almaniya hate veşartin.

Îbrahîm Mihemed Qadêr (Îbramê Efendî), ji gundê Hopka – Reco, sala 1921 an ji dayîk bûye, tenayî dê û bavê xwe bû, û di çar saliyê de bavê wî mir. Sala 1930î, li ber dsetê Xoce xwend, sala 1932 an derbasî yekemîn dibistana fermî ya ku, li Reco vebûye bibû, piştî du salan tev pismamê xwe yê mezin çû bajarê Qirixanê-Entakiye-Turkiyê, li wir jî derbasî dibistana Ferensî bû, ta ku, nasnameya Sertefîka stand, û li bajarê Entakiya yê xwendina amedahiyê bi dawî kir, lê sala dawî ji ya serete nestand. Di navbera salên 19431944-an de, vegeriya gundê xwe, bi xwe re hin pirtûk anîn, bi ked û cefayê xwe jiyana xwe berdewam kir. Di rewşeke siyasî û civakî kambax de, li rex dostên xwe, yek ji wan mervê wî nemir Reşîd Hemo, di warê zanîn û zanebûnê de xebitî, lewre di belavkirina hestên netewî de jî. Sala 1951 an di vekirina yekem dibistan û damezrandina yekem komeleyeke netewî li Efrînê hevpar bû, ji ber wê tev hevalên wî (Reşd Hemo û Şewket Ne›isan) hatin girtin û nêzî mehkê di hepsa Elmezê – Şam de man. Pişt re demek dirêj ji jiyana xwe di kar û barê wergerandina herdu zimanê Erebî û Turkî de derbas kir. Roja 10.05.2018 an, li Efrînê çav damrandin û çû ser dilovaniya Xwedê. Mixabin, ji ber rewşa Efrînê ya taybet, di bin dagîrkeriya Turkiyê de, xelkê Kurdaxê nikaribûn bi baştirîn cure herdu nemirên xwe oxir bikin.

***Serê gelê Kurd û malbata her du nemiran sax be, cihê wan bihuşt be. Bi navê Desteya NEWROZê em srsaxiyê ji her du malbatan re hêvî dikin.***

# Nameyek ji Rizoyê Dêrsimî



**«Kek Newaf...Bira Can, dilê me digîre, xwîn di dilê me da diherike ji bo Efrînê, gelo rewş di çi merhalêda ye? Bi rastî ez gelek gelek xem dikim. Ne tenê ez, hemû Kurdperwerên vî welatî dilşîn in ji bo Efrînê. Ji kerema xwe rewş çawaye ji min ra bi kurtî binivîsîne.**

**Rewşa mina tendurustî roj bi roj ber bi xirabîyê diçe. Sal bûn 83, çala kûr nêzik bûye.**

**Min ji bo Efrînê bi zara dijmin nivîsek nivîsî, ji bo malpera Navkurd û Roja Welat, di bin nivîsê da jî êşa dilê xwe yê ji bo Efrînê bi zara dayîka xwe helbestek wekî Mersîye nivîsî, ez wê Mersîye ya êşa dilê xwe ji te ra bişînim. Ku lîyaq dibînî di kovara «Pirsê» da biweşîne...»**

**Rizoyê Dêrsimî**
**Sydney 02.03.2018**
**---------------------**

***Mersîye ya Efrînê.***
***Ku Heye Xwedê***
***Nepejirîne***

**Hey lê lê**
**Hey lo lo**
**Bavo, yadê**
**Xuşk û birano**
**Efrîn e, Efrîn e**
**Erdê wê çîya û deşt in**
**Hêşin e, şîn e**
**Warê zeytûnên reş û hinaran**
**Rez û bostan**
**Li zozanan naxirên pêz**
**Çelêk, bizin û mî ne**
**Lê îro Tirkên barbar**
**Efrîn kirîye çeperê**
**Dor pêçane**
**Li wir tê kuştin jîyan e**
**Jîn e**
**Pitikên hundur dergûşan**
**Kal û pîr in ....... 7**

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**